# LÊPIRSÎNA PENABERIYÊ LI DAÎREYA KOÇBERAN

Tu hatî gazîkirin bo lêpirsîna penaberiyê li Daîreya Koçberan. Vê şîretnameyê baş bixwîne ku behsa maf û peywirên te dike di lêpirsînê de. eger pirsên te li ser şîretnameyê hebin, tu dikarî wan di lêpirsînê de ji karmendê Daîreya Koçberan bikî.

## Mebesta lêpirsînê çi ye?

- Te dawa penaberiyê li Fînlandayê kiriye. Di lêpirsînê de dê wan sebeban ji te bipirsin ka tu çima dawa penaberiyê ji Fînlandayê dikî û çima nikarî vegerî welatê xwe.
- Giring e ku tu hemû sebebên dawaya xwe di vê lêpirsînê de bibêjî. Eger hinek sebebên din piştî vê lêpirsînê peyda bibin yan bixwazî li ser sebebên pêştir agahiyên nû bidî, di zûtirîn demê de Daîreya Koçberan yan dadgeha birêvebera dawaya te haydar bike.
- Di lêpirsînê de tenê dawa penaberiyê tê meşandin. Eger te endamên malbata xwe li Fînlandayê hebin, divê tu dawa îqameyeke malbatî bikî. Divê tu dawanameyeke din ya bi pare pêşkêş bikî.

## Di lêpirsînê de çi mafên te hene?

- Te maf heye di lêpirsînê de parêzer an avukat bi kar bînî. Parêzer bi xwe biryara beşdarbûna xwe dide.

- Divê tu bi xwe avukatekî peyda bikî. Eger avukat peyda nekî, em dikarin lêpirsîna te bêyî avukat jî bikin.
- Di lêpirsînê de terciman heye. Karê terciman ew e ku her tiştê gotî bi bêalîtî wergerîne. Terciman dikare li wî cihî be yan jî li ser telefonê yan vîdyoyê be.
- Lêpirsker, terciman û parêzer xwedî wezîfeya parastina surran in anku nabe ew tiştên di lêpirsînê de bihîstî bo kesên din aşkere bikin. Tiştên ku tu behs bikî, dibe tesîrê li dawanameyên endamên malbata te jî bikin. Em dikarin tiştên tu behs dikî ji endamên malbata te jî veşêrin eger aşkerebûna wan dibe ziyanê yan metirsiyê bigihîne te yan kesûkarên te. Dikarî di lêpirsînê de nêrîna xwe li ser bibêjî.
- Belgenameyên li ser doza te bi surrî tên parastin.

## Di lêpirsînê de çi berpirsiyarên te hene?

- Li ser berpirsiyariya te ye ku behsa wan halet û sebeban bikî ku çima dawa penaberiyê dikî. Bo te baş e ku bi rastî behsa hemû sebebên heyî di lêpirsînê de bikî.
- Bo te baş e ku herwiha behsa pirsgirêkên dijwar jî bikî. Mumkin e ku ew çaresaz bin li ser biryara ku bidin te.
- Eger tiştekî nizanî yan neyê bîra te, hewl nede ku bersivekê ji bal xwe ve çêkî. Dayîna agahiyên nerast dikare bibe sebebê bawernekirina ji dawa te.
- Di lêpirsînê de nasnameya xwe rast bibêje Eger belgenameyên ku bikarin pê nasnameya te bipeyitînin, divê hewl bidî wan peyda bikî û bigihînî Daîreya Koçberan. Ev belge bo nimûne belgeyên nasnameyê û belgeyên seferkirinê ne. Lê Daîreya Koçberan nikare te mecbûr bike wan peyda bikî eger ew bibe sebebê metirsiyê li ser te yan kesûkarên te. Tu dikarî dûvre agahiyên nasnameya xwe tenê bi belgenameyên resmî yên hikûmî biguherînî. Tu dikarî dûvre agahiyên nasnameya xwe tenê bi belgenameyên resmî yên hikûmî biguherînî.
- Daîreya Koçberan agahiyên nasnameya te di sicila karûbarên biyaniyan de qeyd dike ku tomareke hikûmî ye û di meşandina karûbarên dawanameyên te dixebitîne.
- Dayîna agahiyên kesî yên nerast ji karbidestan re yan pêşkêşkirina agahiyên nerast bo tomarkirina di sicilên fermî de tawan e ku tê cezakirin.
- Haydar be ku dayîna agahiyên şaş yan veşartina agahiyên rast dikare paşî bibe sebebe betalkirina îqameya ku hatiye dayîn yan meşandina karûbarên te dijwar bike.

## Çawa xwe bo lêpirsînê hazir bikî baş e?

- Berî lêpirsînê hemû şîretên karbidestan dayî te bixwîne û bîne bîra xwe. Giring e ku tu belavokên derbarê rêkarên Dublînê binasî. Eger ew belavok li ba te nebin, dikarî wan ji malpera Daîreya Koçberan peyda bikî: migri.fi/esitteet. Belavok li bin sernavê "Turvapaikka ja Dublin-menettely" (Penaxwazî û rêkara Dublînê) ye.
- Eger ji ver sebekek maqûl hêvî bikî ku terciman an lêpirsker jin an mêr be, berî roja lêpirsînê bibêje karmendekî kampa xwe. Karmend dê hêviya te bigihîne Daîreya Koçberan. Eger tu li yekîneya girtî yan li dezgeheke din bî, behsa meseleyê ji karmendên vehewîngeha xwe re bibêje. Daîreya Koçberan biryar dide ka sebeb maqûl e.
- Eger halê te yê laşî yan ruhî wisa be ku tesîrê li ser lêpirsînê bike, bibêje karmen-dekî kampa xwe. Karmend dikare bi izna te berî lêpirsînê wê bibêje Daîreya Koçberan.
- Xwarinê yan pare bo firavînê li gel xwe bîne.
- Dermanê bi rojê bo te lazim bin li gel xwe bîne.
- Hemû wan belgename û îsbatan li gel xwe bîne ku têkilî dawa te ne.
- Zarokan li gel xwe neîne eger ew jî nehatibin gazîkirin bo lêpirsînê. Eger tu hew-ceyî çavdêriya zarokan bî, berî roja lêpirsînê bibêje kampa xwe.
- Berî dema xwe were. Bo gihiştinê zû bi rê bikeve. Kampa te dê şîretan bide te ku çawa dikare bigihî Daîreya Koçberan.

## Roja lêpirsînê li Daîreya Koçberan wiha bike

- Nikarî bêyî sebebekî rewa dema lêpirsîna xwe paş bixî. Eger roja lêpirsînê nexweş bî, yekser navenda pêşwazîkirina xwe agahdar bike. Divê tu gotareke hemşîreyan yan bijîşkan derbarê nexweşiya xwe bigihînî Daîreya Koçberan ne derengtir ji 1 hefteyê ji roja lêpirsînê ve. Eger bêyî sebebeke maqûl li lêpirsînê hazir nebî, dikarin bêyî lêpirsînê biryar were dayîn.

- Gava tu tê avahiyê Daîreya Koçberan, dikarin teftîşê li te bikin.
- Karta xwe y amis teriyatiyê nîşanî dergehvanê Daîreya Koçberan bide.
- Tenê kesên gazîkirî dikarin bên avahiyê Daîreya Koçberan û kesên ku biryar li ser hatina wan li gel te hatiye dan.
- Eger bixwazî alîkarek li gel te bê, tu yan ew dikare pêştir bi nivîskî ji Daîreya Koçberan daxwaz bike. Wek din lêpirsker biryarê dide ka alîkar dikare beşdar bibe yan na. Alîkar ne parêzer e û beşdarî ronkirina meseleyê nabe.
- Lêpirsker karmendekî Daîreya Koçberan e. Ew dikare li cih be yan jî bi riya vîdyoyê bes_dar bibe.
- Dengê lêpirsînê tê qeydkirin. Li odeyê herwiha kameraya çavdêriyê ya qeydker heye.
- Lêpirsîn hemû rojê vedikêşe. Di navberê de bêhnvedana firavînxwarinê û hinek bêhnvedanên din hene. Tu dikarî herdem dawa bêhnvedanê bikî.

- Eger hewce be, dikarin rojeke din lêpirsînê bidomînin. Hingê dê careke din gaziyek bo te bê.

## Di lêpirsînê de çi dibe?

- Destpêkê lêpirsker dibêje ka di lêpirsînê de çi dibe û piştrast dike ku tu maf û peywirên xwe fehm dikî. Bipirse eger tiştekî fehm nekî. Bibêje eger ji terciman fehm nekî.
- Eger pêştir bi dûrûdirêjî li ser nasnameya te nehatibe pirsîn, lêpirsker wan pirsan dike. Ew dipirse ka malbata te kî ne, tu li kû derê jiyayî û bi çi rê hatî Fînlandayê. Lêpirsker herwiha hin tiştan ji te dipirse daku bizane ka dawanameya te li Fînlandayê were lêkolîn yan na.
- Piştî hingê dipirse tu çima ji welatê xwe reviyayî û çima nikarî vegerî. Tiştên ku bi serê te hatine bi rastgoyî behs bike û heta mumkin be bi hûrgilî.
- Lêpirsker çend pirsên deqîqker derbarê wan wan tiştan dipirse ku behs dikî. Bi rastgoyî bersivê bide. Bibêje eger tu nizanî yan nayê bîra te.
- Hinek pirsên giştî ji hemû penaxwazan tên kirin. Lêpirsker herwiha dipirse ka raya te li ser derkirina ji welatî û qedexekirina vegerînê çi ye.

- Daîreya Koçberan dikare di lêpirsînê de derbarê mijarên tesîrker li ser biryarê ji te bipirse. Bo nimûne, eger şik hebe ku te li Fînlandayê tawanek kiriye yan tu hatî hukimdan, dibe ku tesîra wê li ser biryara Daîreya Koçberan hebe. Daîreya Koçberan di lêpirsînê de derfet dide ku tu nêrîna xwe li ser bibêjî.

- Hevpeyivînker bi riya vîdyoyê lêpirsînnaeyê bi re bi temamî yan beşeke wê dixwîne eger bi nêrîna Daîreya Koçberan hewce be. Eger hevpeyivînker bi te re lêpirsînnameyê bi temamî nexwîne, rojeke diyarkirî dide te ku dikarî heta hingê verastkirin û lêzêdekirina bişînî. Kopiyeke lêpirsînnameyê ji re bişînin daku li ba xwe hilgirî.

## Daîreya Koçberan çawa biryarê dide?

- Li ser dawa te mumkin e ku mafê penaberiya navneteweyî yan îqameyê ji ber sebebên insanî yan ji ber qurbaniya bazirganiya bi mirovan bidin te.
- Daîreya Koçberan biryarê li ser agahiyên te di lêpirsîna penaberiyê de dayî û belgeyên din yên pêşkêşkirî dide. Daîreya Koçberan dikare bo biryarê li agahiyên giring ji çavkaniyên aşkere li bigere.
- Eger hewce be, Daîreya Koçberan dikare lêkolînê li ser orijînaliya belgenameyên te dayî bike. Karbidestên welatê te ti agahiyê ji wan wernagirin û ew lêkolîn nabin sebebê xeteriyê li ser te yan mirovên te.

- Eger hevpeyivînker hemû lêpirsînnameyê di hevpeyivînê de nexwîne, dê rojeke diyarkirî bide te bo şandina zêdekirin û verastkirinan. Dikarî ronkirinên zêdetir heta roja biryardanê bişînî. Agahdar be ku ronkirin belkî di biryarê de neyên raçavkirin. Ronkirinan bi nivîskî bişîne.
- Eger dawa te bêt redkirin, dikarin te vegerînin û hatina bo Fînlandayê û welatên din yên hevpeymanên Schengenê li te qedexe bikin.
- Eger dawa te were redkirin yan dawanameya xwe betal bikî, dikarî dawa alîkariya vegera dilxwazane bikî. Ji navenda pêşwazîkirina xwe şîretan bipirsî yan li agahiyan û têkiliriyan li malpera şiretên vegerê ya Daîreya Koçberan binêrîn [migri.fi/paluu](migri.fi/paluu).
- Eger te hin sebebên nû yên penaxwaziyê hebin, wan di zûtirîn demê de ji karmendan re bibêje gava ku êdî dawa te ya penaxwaziyê ne çalak e. Eger di zûtirîn demê de mijar û sebebên penaxwaziyê pêşkêş nekî, dibe ku wan li ber çavan negirin gava ku dawayeke nû ya penaxwaziyê bikî. Divê te sebebek hebe ku çima ew pêştir pêşkêş nekirine. Sebeb divê wisa be ku te bi xwe nikariye tesîrê lê bikî. Piştî hingê Daîreya Koçberan dê lê binêre ya dawaya te qebûl bike yan na.